

Li Bakurê Sûriyê amaderkariyên cejnê

354 ciwan tevî hêzên parastinê bûn



Akademiya Leşkerî li Girê Spî û Minbicê 2 dewreyên leşkerî ku 354 şervan tevî bibûn bi dawî kir. Li kantona Girê Spî Akademiya Şehîd Dijwar dewreya perwedeyê bi beşdarbûna 142 şervanên ji Tebqayê hate destpêkirin. Dewre bi navê Şehîd Merwan Tendûrek hate vekirin. Di dewreya ku mehekê dewam kir şervananan li ser mijarên dewlemend perwerde dîtin. Di heman çarçoveyê de Akademiya Şehîd Feysel Ebû Leyla ya Leşkerî li Minbicê dewreyeke perwedeya nû bi beşdarbûna 212 şervanan vekir. Dewre bi merasîmekê bi dawî bû.

Bi dehan endamên saziyan û komîteyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Minbicê beşdarî merasîmê bûn. Dewre bi navê Şehîd Ebdulhemîd Mihemed ê di hemleya rizgarkirina Minbicê de şehîd bû hate destpêkirin. Dewre 15 rojan deşewam kir. Di dewreyê de dersên leşkerî û bîrdozî hatin dayîn. Di merasîma dawîkirina dewreyê de Endamê Fermandariya QSD'ê Enter Minbic axivî û anî ziman ku perwedeya leşkerî ezmûnek nû daye şervanan da ku rola xwe di parastina xaka xwe de bilîzin. Di dawîya merasîmê de şervanan soz dan ku ew ê erka xwe ya parastina herêmê pêk bînin...**ANHA**

Semad li cotkaran hat belavkirin



Cotkarên navçeya Til Birak ji bo çandina pembo û zebzeyên zivistanî semad wergirtin. Komîteya Çandiniyê ya navçeya li Til Berek semad bi buhayekî kêmtir belav kirin. Li ser daxwaza cotkaran ku pêwîstiya wan bi semadê heye, Desteya Çandiniyê 120 ton semad peyda kir. Belavkirina semadê bi buhayê kêmtir li

cotkarên navçeyê tê belavkirin. Belavkirin ji 9'ê vê mehê dest pê kir. Di beşa yekem a belavkirinê de ji bo her donimek erd 35 kg hate belavkirin. Tê payîn ku wê di beşa duyem a belavkirinê de 80 ton, beriya Cejna Remezanê were belavkirin. Buhayê her tonek semad 225 hezar lîreyên Sûrî ye...**ANHA**



Bi nêzîkbûna Cejna Remezanê sûkên gelêrî yê gundewarên rojhilatê Dêrzorê qerebalix dibê. Sûk di serê sibehê de heta saetên dawîya şevê tijî dibê. Di hefteya dawî a meha remezanê de, şênî amadekariya cejnê dikin. Cilên cejnê dikirin û hemû cureyê kulîçeyê cejnê weke kevneşopiyekê çêdikin. Sûka El-Cizrat bi biharatên xwe yê cur bi cur navdar e. Sûk bi taybet di cejnê de dibê meqsada şênîyan. Jin ji bo çêkirina kulîçeyê diçin sûkê û pêdiviyên wê dikirin. Welatîyê bi navê Im Rebî ji şênîyên El-meyadîn a li El-Cizrat yê girêdayî gundewarên Dêra zor dimîne got, "ez pêdiviyên cejnê ji sûka El-Cizrat dikirim. Buhaya madeyan li gorî salên borî pir kêmtir bûye."

Im Rebî spasiya hêzên QSD'ê kir ji ber ku herêmên wan ji dagirkeriya DAIŞ'ê rizgarkirin û bi saya wan ew cejn bi aramî pîroz dikin. Şêraniya cejanê cihê kêfxweşî û şadiya zarokan e, ruxmî rewşa aborî ya dijwar lê malbat tevdira şêraniya cejnê dikin. Yunis El-Yunis xwediye dikana frotina cilên zarokan diyar kir ku bi dawîbûna remezanê re, ji ber frotina cilan a zêde karê wan baş bûye.

LI TIL HEMÎS AMADEKARIYÊ CEJNÊ

Ji aliyê din ve Şênîyên navçeya Til Hemîs a kantona Qamişlo amadekariyên Cejna Remezanê dikin. Bi rasthatina Cejna Remezanê re sûk bi pêdiviyên cejnê tijî bûye. Şênî bi kêfxweşî xwe ji bo cejnê re amade dikin. Macid El-Naîm diyar kir ku şênîyên navçeyê zêde amadekariyên cejnê dikin. El-Naîm hêviya aştî ji hemû herêman re di vê cejnê de xwest. Welatîyê bi navê Seyah El-Xelef destnîşan kir ku piştî herêm hate rizgarkirin şênî bi kêfxwî û azadî cejnê pîroz dikin.

EL KERAMÊ XWE JI CEJNÊ RE AMADE DIKE

Piştî rizgarkirina herêma El-Keramê ya girêdayî Reqayê, şênîyên herêmê bi kêfxweşî cejna Remezanê pêşwazî dikin û aştî û aramiyê ji hemû herêmên Sûriyê re dixwazin. Cejna Remezanê nêz dibê û bazarên herêmê bi hemî pêdiviyên cejnê tijî bûne. Şênîyên El-Keramê bi kêfxweşî û azadî cejnê pîroz bikin. Berberê bi navê Ehmed El-Casim got: "Di dema DAIŞ'ê de min dikana xwe girt, ji ber ku DAIŞ nedihîşt kesek bê gel berber û rih û pora xwe

Gerîla dîsa lê da: 32 leşker hatin kuştin



Çalakiyên gerîla yê li dijî artêşa Tirk a dagirker berdewam dikin û derbên giran li artêşa Tirk didin. Navenda Ragihandinê û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên vê dawiyê yê gerîla yê li Colemêrg, Amed, Şîrnex û li herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê daxuyanîyê nivîskî weşand û diyar kir ku 32 leşkerên Tirk hatine kuştin **R-2**

Li Îmraliyê pêkanînen nû

Serdozgeriya Komarê ya Bûrsayê a Tirkîyê ya Dadweriya Înfazê ya l'emin a Bûrsayê derbarê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û girtiyên din ku di Girtîgeha Îmraliyê de ne biryareke nû daye. Dadweriya Înfazê ya 1. a Bûrsayê hemû pêwendiyên nivîskî, mafê telefonê, serdana xizim û parêzeran li hemû girtiyaran qedexe kir. Parêzer li ber vê biryarê rabûn, lê daxwaza wan nehat qebûlkirin. **R-5**



Bersiva êrîşan yekîtîya Kurdan e



Sekreterê Partiya Çep a Kurd Mihemed Mûsa diyar kir ku armanca dewleta Tirk bi êrîşên li ser Başûrê Kurdistanê, têkîbirina desketiyên hemû Kurdan e. Mûsa got, "Erdoganê ku têk çuye êrîş hemû cih û warên Kurdan dike. Bersiva mezin ya ji bo êrîşan yekîtîya gelê Kurd e." **R-4**

Armanca me rizgarkirina welatîyên herêmê ye



Berdeka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Abdullah anî ziman ku hemleya Bagera Cizîrê berdewam dike û şer di navbera QSD'ê û çeteyên DAIŞ'ê de didome. Lîlwa wiha got, "Çeteyên DAIŞ'ê bi êrîşên dijber hewlê didin li pêşîya pêngavê asteng bikin. Gel weke mertalên zindî bikar tînin. Û destûr nadin gundiyan ku ji gundên xwe derkevin. Lê hêzên bi operasyonên taybet sivîlan rizgar dikin." **R-3**

Erdogan li ber ketinê ye



Namzetê Serokkomariyê Selaheddin Demirtaş ji bo Erdogan got, "dema wî zêde nemaye" û destnîşan kir ku guhertin şert e û ev jî nêz e. Demirtaş diyar kir, dagirkeriya Efrînê û tifaqa bi MHP'ê re wê terciha Kurdên AKP'yi jî biguherîne. **R-4**

Çar partiyan Kurd wê destekê bidin Demirtaş



Çar partiyan siyasi yê Kurdistanî Tevgera Azadî, PAK, PDK û PSK'ê bi navê "Tifaqa Hilbijartinê ya Kurdistanî" biryar dan ku di hilbijartinên 24'ê Heziranê de destekê bidin namzetê HDP'ê ye Serokkomariyê Selaheddin Demirtaş. Tifaqê got, "Ev helwesta me wê zemînekê amade bike ku di tûra duyemîna hilbijartinên Serokkomariyê de destê Kurdan xurtir bibe." **R-4**

Divê helwestê nîşanî dewleta Tirk bidin



Yekîtîya Liberal a Kurdistanê êrîşên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê yê li ser Efrînê şermazar kir. Yekîtîyê bang li civaka navdewletî kir ku dawiyê li êrîşên dagirkeriya Tirk bîne. Her wiha Yekîtîya Liberal bang li hikumeta Iraqê û Herêma Başûrê Kurdistanê ji kir ku li hemberî êrîşên tirk li ser başûr helwesta xwe nîşan bidin. **R-5**

Ji Silêmaniye Heta Qendile



ERDOGAN DIJMINÊ KURD E

Dewleta Tirk di dijminatîya li kurdan de sînore nas nake. Li çar aliyan Kurdistanê û cihanê dijminatîyê li dijî kurdan dike û êrîş desketiyên wan dike. Rêjîma Erdogan ya ku li ber têk çûnê ye ji bo ku desthilatîya xwe li ser piyan bigire bi her awayî êrîş kurdan dike. Piştî Efrînê vê carê jî Qendil, Şengal û Mexmûr xistiye hedefa êrîşên xwe.

BERÊ XWE DAN QENDILÊ

Gelê Kurd jî li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk di nava liv û tevgerê de ye. Bi taybet gelê başûrê Kurdistanê li dijî dagirkeriya Tirk e û dixwaze ku dagirkeriya Tirk ji başûrê Kurdistanê were bi dawî kirin. Gelek kes li Silêmanî li hev civiyan û ji bo gefên dagirkeriyê yê dewleta Tirk şermazar bikin, berê xwe dan Qendilê. **R-2**

Ti hêz wê nikaribe têkoşîna me bişkîne



Bi hezaran welatîyên Efrînê yê ku ji ber êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk li herêma Şehbayê bi cih bûne li dijî dagirkeriya Tirk meşeke girseyî lidarxistin. Meş bi durûşmêyên, "Na ji bédengîya cihanê re, serkeftin a gelê Efrînê ye" hat lidarxistin. Meşa ku veguherî mitîngê axaftin hatin kirin û hat gotin ku wê ti hêz nikaribe têkoşîna gelê Kurd bişkîne. **R-2**

Wê dagirker nikarinbin bikevin xaka me



Çalakiya mertalên zindî ya ciwanên welatparêzên Başûrê Kurdistanê li Qendilê di roja 5'an de didome. Bi dehan kesên ku ji Rojavayê Kurdistanê hatin serdana çalakgeran kirin. Di çalakiyê de axaftin hatin kirin û wiha hat gotin, "Li dijî şerê qirêzê tê birevebirin em ê bi iradeya xwe şer bikin. Wê ti caran dagirker nikarinbin bikevin xakan". **R-2**

Ciwanên Babê li dijî dagirkeriya Tirk rabûn

Dewleta Tirk a dagirker ku du sal in Bab dagir kiriyê, zexteke giran li gelê bajêr dike. Ciwanên Babê jî li hember zext û dagirkeriya Tirk rabûn. Ciwanên jî bajêrê Babê, zextên hêzên asayîşê yê dewleta Tirk ên li ser gel protesto kirin û xwestin ji bajêr derkevin. **R-2**

Gelê başûr dagirkeriya Tirk naxwaze

Dewleta Tirk di dijminatîya li kurdan de sînore nas nake. Rêjîma Erdogan ya ku li ber têk çûnê ye ji bo ku desthilatiya xwe li ser piyan bigire bi her awayî êrîşî kurdan dike. Piştî Efrînê vê carê jî Qendîl, Şengal û Mexmûr xistiye hedefa êrîşên xwe.

Siyasetmedar, pêşmerge û hunermendan berê xwe dan Qendîlê Nerazibûna li dijî êrîşên dagirkeriyê yê dewleta Tirk zêde dibe. Komek ji siyasetmedar, pêşmerge û hunermendan ji Silêmanî berê xwe da Qendîlê. Duh gelek kes li Silêmanî li hev civiyan û ji bo gefên dagirkeriyê yê dewleta Tirk şermezar bikin,

berê xwe dan Qendîlê. Rêveber û endamên Tevgera Azadî, Eniya Gel a Demokratîk, REJAK, Tevgera Çand û Hunerê ya Demokratîk ber destê sibehê bi 2 otubusan berê xwe dan Qendîlê. Pêşmergeyên Dêrîn, Helbestvan û Hunermend jî di nava komê de hene.

Girseya gel wê li Qendîlê konê çalakiyê yê ciwanan ziyaret bike. Piştî jî wê daxuyanîyekê bide çapemeniyê. Endamên Tevgera Ciwanên Welatparêz a Başûrê Kurdistanê, çend roj berê çûn Qendîlê û dest bi çalakiya “Mertalên Zindî” kirin. Çalakiya ciwanan dewam dike.



Efrîn li dijî dagirkeriyê meşiya



Bi hezaran welatiyên Efrînê, bi armanca şermezarkirina dagirkeriya Tirk ya li dijî Efrînê û bédengiya navneteweyî ya li hemberî dagirkerina Efrînê, li kantona Şehbayê meşek girseyî lidarxistin. Bi hezaran welatiyên Efrînê yê ji cih û warên xwe koç kirin û li Şehba bi cih bûne, bi armanca dagirkeriya li ser Efrînê şermezar bike

meşek girseyî pêk anî. Çalaki bi dirûşma “Ji bédengiya cihanê re na, serkeftin a gelê Efrînê ye” pêk hat. Di meşê de bi hezaran welatiyên Efrîniyên yê li kampên kantona Şehbayê bicih bûne amade bûn. Welatiyên ku li ber Navenda Heyva Sor a Kurd dest bi meşê kirin, ber bi Qada Ehrezê ve çûn. Di meşê de welatiyan dirûşmên “Bijî berxwe-

dana serdemê” û “Bijî Serok Apo” berz kirin.

‘BÊDENGİYA CİHANÊ ŞERMEZAR KIRIN’

Meşa efrîniyan li Qada Ehrezê veguherî mîtingê. Li ser navê girseyê endama Meclîsa Kantona Şehbayê Henan Osman daxuyani xwend. Osman, dagirkeriya Tirk şermezar kir. Osman, bédengiya qada navneteweyî ya li hemberî dagirkerina Efrînê jî bi tundî şermezar kir û xwest Tirkiye dest ji dagirkerinê berde. Osman herî dawî wiha got: “Dê tu hêz nikaribe têkoşina gelê kurd bişkîne û vîna gelê kurd teslim bigire.”

Ciwanên Babê li dijî dagirkeriya Tirk rabûn



Ciwanên ji bajarê Babê xwestin, hêzên asayîşê yê dewleta Tirk ji bajêr derkevin.

Ciwanên ji bajarê Babê, zextên hêzên asayîşê yê dewleta Tirk ên li ser gel protesto kirin û

xwestin ji bajêr derkevin. Dewleta Tirk a dagirker ku du sal in Bab dagir kiriye, zexteke giran li gelê bajêr dike. Li bajêr hema hema her roj teqîn û şer rû didin. Hemû hêzên asayîşê, polis û leşkeriyê di kontrola dewleta Tirk de ne. Hêzên asayîşê yê ser bi dewleta Tirk zexteke giran li gel dikin. Ciwanên ji Babê li navenda bajêr li hev civiyan û hêzên asayîşê protesto kirin. Ciwanan ji bo azadiya Babê dirûşm qiriyân û xwestin, hêzên dewleta Tirk ji bajêr derkevin.

Sadr û Koalîsyona Fefîh li hev kirin

Berdevkê Çapemeniyê yê Ofîsa Serokwezîrtiyê yê Iraqê Saîd Hadîsî têkildarî êrîşên artêşa Tirk a dagirker ya li ser Başûrê Kurdistanê got ku, “Ev tê wateya bînpêkirina serweriya Iraqê, em qebûl nakin.”

bomberdûman dike û leşkerên xwe sewqî herêmê dike. Ev tê wateya bînpêkirina serweriya Iraqê. Em vê rewşê qebûl nakin.”

Berdevkê Çapemeniyê yê Ofîsa Serokwezîrtiyê yê Iraqê Saîd Hadîsî têkildarî êrîşên artêşa Tirk a dagirker ya li ser Başûrê Kurdistanê daxuyani da. Hadîsî diyar kir ku helwesta Bexdayê ya li hemberî vê dagirkeriya Tirkiyê eşkere ye û got, “Mafê Iraqê heye ku parastina serweriya xwe bidomîne. Tirkiye bêyî ku destûra Iraqê hebe, bi hinceta ku baregehên PKK”ê heye, Herêma Kurdistanê



Hadîsî got, “Êrîşên artêşa Tirk a li ser Herêma Kurdistanê rewşa heylî tevlihevtrî dike. Em nikarin çavê xwe ji artêşa Tirk re bigirin.”

Nerazibûnên li dijî biryara darvekirina ciwanê Kurd Ramîn Hisên Penahî her diçe mezin dibe. Amnesty International nameyekî ji 33 hezar îmzeyên ji aliyê welatiyên Norwêcî ve hatiye îmze kirin ji bo betalkirina cezayê Ramîn radestî rejîma Îranê kir. Rêxistina Amnesty International nameyekî ji bo betalkirina biryara darvekirina ciwanê Kurd Ramîn Hisên Penahî arasteyî hikûmeta Îranê kir. Di nameya

Wê dagirker nikarinbin bikevin xaka me



Ciwanên Welatparêz ên Rojava li Qendîlê çûn serdana ciwanên welatparêz ên Başûrê Kurdistanê ku li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li Qendîlê dest bi çalakiya mertalên zindî kiribûn.

Agirî wiha dewam kir, “Em weke ciwanên welatparêz, xaka xwe biparêzin. Bi salan e dewleta Tirk a faşîst li ser xakên me yê kevin politikayên qirêj dimeşîne. Herî dawî Efrîn dagir kirin. Li dijî dagirkeriyê me berxwedaneke mezin nişan da. Niha ji helwesta wan ya dagirkerina Qendîlê heye. Em ê li dijî vê hişmendîya qirêj şerê îradeyê bikin û têbikoşin. Divê hemû ciwan li derdora vê xelekê kom bibin”.

Amnesty 33 hezar îmze ji bo Ramîn radestî Îranê kir



Nerazibûnên li dijî biryara darvekirina ciwanê Kurd Ramîn Hisên Penahî her diçe mezin dibe. Amnesty International nameyekî ji 33 hezar îmzeyên ji aliyê welatiyên Norwêcî ve hatiye îmze kirin ji bo betalkirina cezayê Ramîn radestî rejîma Îranê kir. Rêxistina Amnesty International nameyekî ji bo betalkirina biryara darvekirina ciwanê Kurd Ramîn Hisên Penahî arasteyî hikûmeta Îranê kir. Di nameya

ku hate radest kirin de îmzeya 33 hezar û 356 welatiyên Norwêcî heye. Rêxistina Amnesty a Navnetewî ya Norwêcî jî bo betalkirina cezayê darvekirinê ya li Ramîn hatiye birrîn xebatên komkirina îmzeyan berdwam dike. Zêdetirî 2 hezar welatiyên medenî û mafê mirovan nameyekî îmze kirin û xwestin cezayê darvekirinê yê Ramîn bê betal kirin.

Festîvala Fîdan Dogan li Parîsê pêk tê

Jinên Kurd ên li Fransayê wê 17'ê Hezîranê roja Yekşemê 2. Festîvala Jinê ya Fidan Dogan lidarbixin. Festîvala wê bi şiyara “Azadiya jinê li dijî qirkirina jinê” ji bo bîranîna Fidan Dogan pêk were. Festîval ji aliyê Tevgera Jinên Kurd a Fransayê (TJK-F) û Nûnertiya Navneteweyî ya Tevgera Jinên Kurd ve tê organîzekirin.

Jinên Kurd ên li Fransayê wê 17'ê Hezîranê roja Yekşemê di 2. Festîvala Jinê ya Fidan Dogan (Rojbîn) de li hev bicivin. Festîvala ku bi şiyara “Azadiya jinê li dijî qirkirina jinê” ji bo bîranîna Fidan Dogan (Rojbîn) tê lidarxistin, wê 17'ê Hezîranê li Parîsê li Parka Creteil Pompadour Val De Marne pêk were.



Festîval ji aliyê Tevgera Jinên Kurd a Fransayê (TJK-F) û Nûnertiya Navneteweyî ya Tevgera Jinên Kurd ve tê organîzekirin. Parlamentera Partiya Komunîst a Fransayê Marie Georges Buffet, Senatora Val De Marne Laurence Cohen, Hevseroka Meclîsa Herêma Nathalie Dinner û Seroka Komeleya France-Kurdistan Sylvie malovaniyê jî festîvalê re dikin. Ji bo festîvalê bangawaziyek hate weşandin û gelek siyasetmedarên jin ên Fransî û saziyên jinan mohra xwe danî binî. Çend jî kesayet û

saziyên mohra xwe danîne binê bangawaziyê: Senator Christine Prunaud, Sekretera Neteweyî ya Partiya Çep Corinne Morel Darleux, Koordînatorka Partiya Çep û yek ji nûnerên saredariya Parîsê Danielle Simonnet, Sekretera

Neteweyî ya Partiya Çep Laurence Pache, Berpirsara Champigny a Partiya Kesk, Meşa Jinê ya Cihanê, Koordînasîyona Jinê ya Neteweyî ya Fransayê, Jinên Piştewan, Jinên Tamîlî, Kolektîfa Amazing, Tevgera Aştiyê, Tevgera Biratiya Gelan

a li dijî Nijadperestiyê, Komeleya Piştigiriya Jinan bi Kobanê re, Yekîtiya Kabil Fransa, Tevgera Komunîstên Ciwan a Fransayê, Sendikaya CNT, Koordînasîyona Ermenî ya li Fransayê û Sendikaya Solidaire.

Di daxuyanîyê de hate ragihandin ku jinên Kurd parêzvanên azadiya jinên cihanê ne û ev bang hate kirin: “Fidan Dogan (Rojbîn) 9'ê Çileyê 2013'an li navenda Parîsê ji aliyê servîsa veşartî ya Tirk ve tevî du hevreyên xwe Sakîne Cansız û Leyla Şaylemez hate kuştin. Heta bê kuştin, ji bo rizgariya gelê xwe tekoşin. Tevî şerê demdirêjî jî, jinên Kurd berxwedêrên civaka demokratîk, feminîst û ekolojîk in.” Di bangawaziyê de Marielle Franco ya ji Brezîlyayê û Berta Caceres a ji Hondûrasê bi rêzdari hatin bîranîna û hate gotin, têkoşîna ronahî û edaletê ya jinan pîvana bîngehîna festîvalê ye. Ji bo festîvala ku wê 17'ê Hezîranê roja Yekşemê pêk were ev bang hate kirin: “Em bang li hemû jinan dikin ku ji bo xurtkirina piştevaniya jinan a navneteweyî bikevin nava liv û tevgere û xwedî li festîvalê derkevin.”

Li Şengalê dikana amûrên mûzîkê



Êzîdiyên ku ji ber êrîşên DAİŞ'ê Şengal terk kiribûn êdî vedigerin ser cîhê xwe. Ciwanê ku piştî demek dirêj vegeriya Şengalê karê destpêkê ku kir vekirina dikana amûrên mûzîkê bû. Şengal tevî hemû bê derfetî û gefên dagirkeran jî bixwe birînên xwe dipêçe û hewl dide jiyan a xwe bi temamî jî nûve bihûne. Gelek Êzîdiyên ji ber êrîşên

DAİŞ'ê neçar mabûn ku biçin Herêma Kurdistanê, piştî Şengal careke din bi ewle bû vedigerin ser cîhê xwe. Ciwanê bi navê Newaf Heskanî yê şênîyê navçeya Sîntîneye piştî koçberiyekê dem dirêj vegeriya Şengalê û dikana amûrên mûzîkê vekirîye.

TEMBÛRA ŞENGALÊ NAVDAR E

Newaf Heskanî ku nêzî 6 mehe dukaneke amûrên mûzîkê vekirîye wiha dibêje “Ev nêzî 6 mehane min dikana amûrên Mûzîkê vekirîye. Berê niha min li Herêma Kurdistanê vekirîye. Lê, min xwest li Şengalê xizmetê ji civaka



xwe re bikim.” Newaf Heskanî diyar kir ku ew zêdetir tembûran difiroşin û diyar kir ku ji ber tembûra çiyayê Şengalê navdare ew zêdetir girani didin wê û wiha pêde çû, “Em pîrîniya amûrên xwe ji Herêma Kurdistanê finin. Me herî zêde tembûr anîye, ji ber tembûra

Têkiliyên baş yê cîrantiyê



Jinên Heskê yê Rojavayê Kurdistanê bi taybet di meha remezanê de xwarinê çê dikin û bi cîranên xwe re parve didin. Bi vê yekê germahî û tûkiliya di navbera cîrantiyê de pêş dixînin. Têkiliya di navbera cîrantiya gelê Kurd ên li her çar parçeyên Kurdistanê ya gelekî xurt di meha pîroz a remezanê de bêtir xurt dibe. Jinên Heskê jî bo vê çandê zindî bihelîn bi taybet di meha remezanê de diçin serdana hevdu û dema ku diçin serdana hevdu teyîfîkek xwarin jî bi xwe re dibin. Bi vê sayê jiyan komînal jî geştir dibe. Di serdema neolîtîk de çandek komînal hebû. Alav û xwarinên ku zêde diman li gel dihatin belavkirin. Jinên Kurd jî hewl didin ku ji rola xwe ya kevnar dûr nekevin û tûkiliyê di navbera xwe de xurtir bikin. Di heman demê de gelê Kurd jî çanda mewanîyê hez dikin û vê yekê di meha remezanê de bêtir dijîn.

DIVÊ JIN LI BER XWE BIDIN

Maşallahê di berdwamiya axiftina xwe de bang li jinan kir ku di jiyandê de tu car bêhêvî nemînin û wiha domand: “Gava ku ez li sazê didim ez gelek kêfxweş dibim. Her tim hevalên xwe yê jin kom dikim û em bi hev re bi kelecaneke mezin li sazê didim. Ev yek min gelek kêfxweş dike. Saz gîyanê mirov sivik dike. Mirov gava kêfxweş be jî û xemgîn jî be dikare li sazê bide. Bavê min digot “Jin nikare li sazê bide, ev ne karê jinan e”. Lê min ev qebûl nekir û ez niha li pey xeyalên xwe me. Heyanî herî jêhatî û serkeftî ne. Bi rastî min di zarokatiya xwe de dixwest ez saz lê bidim. Lê dîsa jî li hemberî hemû şerîmdîtîna astengiyên civakê jî min dev ji lêdana saz bema. Niha zarokên min hene. Bi piştigiriya hevjinê xwe ez niha xeyala xwe ya zarokatiyê li vir pêk tînim. Ez bi sazê xwe tedikoshim û nîşanî didim ku jin dikarin her tiştekî bikin. “

Bi saza xwe tedikoşe



Di civakên bindest û feodal de herî zêde mafên jinan tî bînpêkirin. Ji hûnerê heyani aborîyê her qadeke jiyani jî jinan re mîna şerîm tî dîtîn. Li hemberî vê hişmendîya bavîksalar Maşallah Işîk serî hilda û niha bi sazê xwe tedikoşe. Di civakên feodal de jin jî her qadên jiyandê hatine dûrxistin û gelek ji van qadan jî jinan re mîna qedexê û şerîmê hatîye dîtîn. Jina bi navê Maşallah

Işîk(40) jî yek ji wan jinan e. Maşallah a ku ji saz û hûnerê gelek hez dike, lê ji ber ku civak şerîm dibîne piştî temenekî şûnde xwe digihîjîne mîrazê xwe û niha li Navenda Çand û Hûnera Notaya 8'êmin bi bi lêdana sazê xwe li hemberî hişmendîya bavîksalar tedikoşe.

EZ BI SAZA XWE TÊDIKOŞIM

Zeyneb Tûrgut-JINNEWS



EW ROJ

Girê Spî

Piştî ku li Sûri şer destpêkir, rêveberiya heremê ji sedemên xwe yên stratejîk her dem destguhêrt.Di dawiya sala 2012an de Artêşa Azad a Suryê, Girê Spî dagir- kir. Piştî demek bajêr ket destê El Nusra. Dema ku çeteyên DAÎŞ hatin ber vê bajêrî, El-Nusra bê şer û pevçûn evder radeştî wan kir.

Bi dagirkirina Girê Spî 2 kantonên rojava, Cizîr û Kobanê jî hev qût bûn.

Girê Spî, ji bo DAÎŞ çihêk herî stratejîk bû. Hemû lojîstîka wan jî vî bajêrî derbasi Raqayê dibû. Li vî bajêrî bi dewleta Tirkîyê re têkilî dihatin dayin. Di vî bajêrî de yên li ser Tirkîyê de dihatin derbasi nav DAÎŞ dibûn. Ev têkiliyê wan li Tirkîyê gelek caran bi belgeyan jî hat îspat kirin.

Hêzên kurdan jî bo rizgarkirina vêderê her çiqas hewldan jî, ji bo ku pêngava rizgarkirina Kobanê di rojevê de bû, demek paşve xistin.Di destpêka sala 2015an de Kobanê rizgar bû. Hêzên kurdan YPG û YPJ jî bo rizgarkirina herêma Girê Spî dest bi amadekariyê kirin. Êdî li pêşiya wan rizgarkirina Girê Spî hebû.

Di meha Gulanê de operasyona rizgarkirinê destpêkir. Hêzek jî aliya Kantona Cizîrê, bi navê "Pêngava Şehîd Rûbar Qamişlo" birêket û hêzek jî jî aliya Kantona Kobanê ve birêket

Roj bi roj pêşdiketin. DAÎŞ wundahiyez mezin dîda. Di demek kurt de gundên li başûrê Girê Spî bi destxistin. Bi vê operasyonê xeta lojîstîk ya bi Raqayê ve girêdayî hat qût kirin. Roj bi roj gund dihatin rizgar kirin.

Şer û pevçûnên giran li eniya Til Tamir û çiyayê Evdilezîz derbasdibûn. Li vêder DAÎŞ gelek endamên xwe yên giranbuha wendakir û zahiyyatên mezin da.Hêzên YPG û YPJê her roj 10-15 km pêşve diçûn. Li heremên bidest dixistin, bi aweyek girseyî bi çoşek mezin dihatin pêşwazî kirin.Li aliya şerdikirin û li aliya yek jî, gelên heremê yên dihatin rizgar- kirin, derbasî heremê biwlele dikirin. Ev yek hetanî meha Hezîranê domkir.

Ewroj.....Di 15ê meha Hezîranê de êdî li ber bajêr bûn. Bajêr dorçepandin. Şer û pevçûn bi rojan dewam kir. Di ger- mahiya şer de, gelek sivîlên bajêr terk kir û berê xwe dan sinorê Tirkîyê. Koç destpêkiribû. Ji bo ku DAÎŞ li herderî mayin biçûn kiribû û sivîlan jî wek meralî bikardani, ketina nav bajêr biderengî ket. Û ew roj hat di hemû ajansan de rizgar- kirina Girê Spî derbasdibû.

Ew roj şervanan jî milê kobanê û jî milê Cizîrê ve bi rêketibûn, hatin li qada Girê Spî gihîştin hev û peyman a azadiyê dan. Belê piştî demek dirêj êdî Girê Spî rizgar bû. Lê şopên tahrîbata DAÎŞ li her derî mabûn.

Ji bo paqijkirina van şopan û jî bo jiyanez nû dibin pêşengiya PYDê de pengavek nû destpêkir. Ji bo bajerek nû dest bixe- batan kirin.Îroj.....

Sazî û meclîsên sivil hatin avakirin. Di 22 Cotmehêde PYDê sistema rêveberiya xweser îflankir. Meclîsek jî gelên li vî bajêrê dijiyan hati avakirin. Di rêveberiya vê meclîsê de 10 Erebb, 3 Kurd, 1 Ermenî, 1 Turkmen bi giştî 15 kes hebûn.Bajêr bi Kantona Kobanê ve hatî girêdan. Dîsa jî bo ewlekerî û parastina li bajêr hin hêzên sivil hatin rêxistinikirin. Piştî rizgarkir- ina bajêr bi gelek belgeyên bi destketin de, rastiya têkildariya Tirkîyê û DAÎŞê, bi aweyek zelal hat îspat kirin

Kesên ku koç kiribûn êdî bajêr bi ewle didiştin û vegeeriyarin bajêr.Li asumanên bajêrê Girê Spî alek nû bilind dibe.... Ala YPGê.

Komîteya lihevanîne dozan çareser dike

Gelê Kobanê li dadgehên gel pirsgirêkên xwe çareser di- kin, ew pirsgirêk jî bi rêbazên civakî fêne çareser kirin. Bi destpêkirina şoreşa rojava re komîteya lihevanîne bi roleke girîng radibe. Dozên xwînê yên li herêma Kobanê bê ku biçin dadgehên jî aliya Komîteya Lihevanîne ve fêna çareser kirin.

Doza gundê Xizênê ya dikeve başûrê Kobanê jî aliya hemû kanta- tona Kobanê ve dihat naskirin. Ev jî yek ji dozên tolrakirin] ya herî kevnê li Kobanê ye. Sala 1989'an di navbera malbata Mihemed Bilo û Berkel Bilo ku her du pismamin û jî êla Kêtikane şer derket. 27 salan di encama şerê di navbera her du malbatan 8 kes hatin kuştin û 8 kes jî birîndar bûn. Rûsiyeyên êlên kurdan hewldan ku her du malbatan li hevdu bînin, rejîma Baas a Sûriyê bi zanebûn nedihîşt pirsgirêka her du malbatan çareser bibe û nakokiyên wan diwartir dikirin. Komîteya Lihevanîne ya kantonê, endamên TEV-DEM`ê û endamên Rêveberiya Xweser berî salekê pirsgirêkên di navbera her du malbatên gundê Xizênê çareser kirin. Komîteya Lihevanîne ya kantonê, endamên TEV-DEM`ê û endamên Rêveberiya Xweser berî salekê pirsgirêkên di navbera her du malbatên gundê Xizênê çareser kirin. Komîteya Lihevanîne ya kantonê, endamên TEV-DEM`ê û endamên Rêveberiya Xweser berî salekê pirsgirêkên di navbera her du malbatên gundê Xizênê çareser kirin.

Gelê Kobanê berê xwe didin dadge- han da ku pirsgirêkên xwe çareser bikin, ew pirsgirêk jî bi rêbazên civakî tene çareser kirin. Dozên tolrakirinê yên bi mentiqê eşîretê û pirsgirêkên malbatî yên salên berê li herêma rûdan, bûn se- dema bandoreke neyînî li tatkiliyên civakî bike. Bi destpêka şoreşê re komîteyên lihevanîne hatin birêxistin kirin. Kesên ku jî aliya civakê ve tene qebûl kirin ciyê xwe di komîteyên lihevanîne de girtin.



Li dibistana Azad a bajarê Kobanê di navbera welatîyê bi navê Alaidîn Neiman û Mehmûd Mihemed Cûma şer derket. Cûma jî aliya Neiman ve hat kuştin. Komîteya Lihevanîne jî bi lez ket tevgerê û destê xwe avête pirsgirêke. Ji 7 endamên Meclîsa Malbatên Şehîdan, TEV-DEM`ê û Rêveberiya Xweser li her du mal- batan kombûn û pirsgirêka wan çareser kirin. Di encama pirsgirêka malbatî de hevjinna şênîyeki gundê Babarûşk ku jî gundê Qomçî bû, hat kuştin. Pirsgirêk di navbera malbatan de 5 mehan berdewam kir. Komîteya Lihevanîne 3 mehan li ser vê dozê xebitî. Herî dawiyê civinek ji bo çareser kirina vê pirsgirêkê lidar xist. Ji Rêveberiya Xweser û jî êla her du malbatan kes tevli civinê bûn û pirsgirêk hat çareser kirin. Dozên tolrakirinê yên li herêma Kobanê bê ku biçin dadgehên jî aliya Komîteya Lihevanîne ve hatin çareser kirin. ...ANHA

Ciwanên Reqayê amadekariyên konferansê dikin



Endamê Komîteya Amadekar a Konferansa Yekemîn a Ciwanên Raqqayê Mihemed Xabûr diyar kir ku, armanca konferansê avakirina meclîsa ciwanan û rêxistin kirina wan e. Komîteya Amadekar a Konferan- sa Ciwanên Raqqayê amadekariya Konferansa xwe ya yekemîn ku di 29`ê Hezîranê de were li darxistin, dike. Endamê Komîteya Amadekar Mihemed Xabûr di derbarê amadekariyê Konferansê wiha got: "Di civîna yekemîn a ciwanên

Reqayê de, endamên komîteyên amadekar û rêxistinî hatin hilbijar- tin. Komîte li ser girîngiya û rola Konferansê di rêxistin kirina ciwa- nan de, civînan li dar dixe". Xabûr diyar kir ku armanca Konferansê ew e ku hemî ciwanên Raqqayê xwe rêxistin bikin û rola xwe di civakê de aktîv bikin. Di dawîya axaftina xwe de Xabûr banga vegera welat li ciwanên der- ve kir û got: "Îro welat bi hewce- dariya ciwanan e, divê hemî ciwan vergerin welat û tevli Konferansa Ciwanên Raqqayê bibin"....ANHA

Şaredariya Qamişlo bajar paqij dike

Şaredariya Gel a Şerqî ya bajarê Qamişlo hemleya paqijkirina bajêr jî girêj û tozê ku jî aliya Şaredariya Şerqî ya bajarê Qamişlo ve hatiye destpêkirin didome. Xebatkarên şaredariyê gihîştin kolana Hîzama a li taxa Tey ya bajarê Qamişlo û ew der hemû hate paqijkirin.

Rêveberê Şaredariya Gel Emin Cedû diyar kir ku armanca hemleyê bedewbûna bajar û parastina wela- tiyan e û diyar kir ku hemleya wan berdewam e ta hemû tax û kolan werin paqijkirin.Emin Cedû bang li welatîyan kir ku parastina paqijîya bajar bikin... ANHA



Minbic cejnê pêşwazî dike

Bi hatina cejna Remezane re liv û tevgera li sükên bajarê Minbicê zêde bû. Her kes pêdiviyên cejnê dikire. Şênîyên heremê bi kêfxweşî, aramî û ewlehî pêşwaziya cejnê dikin. Şênîyên bajarê Mibicê xwe jî bo pêşwazîkirina cejna Remezane amade dikin û pêdiviyên xwe bi cih tinin. Welatiyê bi navê Abdulqadir Qehre- man diyar kir ku ew bi hatina cejnê kêfxweş in û wiha got: "Em hatin sükê da ku em pêdiviyên cejnê jî xwe re bikirin. Buhayê pêdivîyan jî baş e. Lê ji vê girîngtir ku em li bajarê xwe kêfxweş in û bajarê me di nav aramiyê de ye."



Malbatên şehîdan hatin xelatkirin



